# KOMELEYA BERÎ HER TIŞTÎ ZAROK

# BELGENAMEYA POLÎTÎKAYÊN TEKOŞÎNA LI DIJÎ BERTÎL Û GENDELÎYÊ

2018

# Komeleya Berî Her Tiştî Zarok

## Belgenameya Polîtîkayên Tekoşîna Li Dijî Bertîl û Gendelîyê

### 1. ARMANC

Armanca vê "Belgenameya Polîtîkayên Tekoşîna Li Dijî Bertîl û Gendelîyê" ew e ku polîtîkayên sereke û sepandina helwesta "Komeleya Berî Her Tiştî Zarok" zelal û eşkere bike. Ev belgenameya polîtîkayê, bingeha esasî ye di hemû pêwendîyên karbeşîya komeleyê da û herwiha di nav "Belgenameya Rê û Rêbazên Xebata Komeleyê" da jî, xaleka girîng û mayinde ye.

### 2. BERGEH

Her kesayetî, sazî û endamê lijneya rêvebirên ku li ser navê "Komeleya Berî Her Tiştî Zarok" tevdigere, divê li gor "Belgenameya Polîtîkayên Tekoşîna Li Dijî Bertîl û Gendelîyê", kar û xebatên xwe bimeşîne.

Kes û sazîyên ku bi komeleyê ra têkildar in, pabendê 'esasên vê belgenameyê ne.

### 3. POLÎTÎKAYA TEKOŞÎNA LI DIJÎ GENDELÎYÊ

Endamên Lijneya Rêvebiran, xebatkar û şîrketên ku li ser navê Komeleya Berî Her Tiştî Zarok kar û barên cuda dimeşînin, di xebat û tevgerên xwe da divê bi tu awayî nebin sedema şik û gumana gendelîyê, li ser kar û çalakîyên komeleyê. Standina bexşên neqdî an jî cureyên bexşên cuda ji sazîyên fermî an jî ji dezgehên civakî -ku pêkan e wek berjewendîyeka şexsî an jî wek gendelîyê bêne binavkirin- teqez hatîne qedexekirin.

#### 3.1. Gendelî Çi Ye?

Bikaranîna xirab a berpirsyarîya peywirê ji bo bidestxistina berjewendîyeka maddî, menfa'eteka me'newî an jî piştevanîyeka cuda, wekî gendelî tê binavkirin. Sûcê gendelîyê hin caran, tenê bi cezakirina sûcdarê sereke yê gendelîyê bi encam nabe; herwiha kesên ku berpirsyar in ji serpereştî, venêran û kontrolkirina

peywirê, an jî rêvebir û temsîlkarên sazîyê jî, ji ber îhmalkirina peywira xwe, dibe ku bên cezakirin an jî rastî lêpirsînên qanûnî bên.

Cureyê herî berbelav yê gendelîyê, bertîl e. Her cure dijayetîya kirina kar an jî nekirina kar û peywirekê, dayîna dirav, pere û cureyên wê, meşandina kar ji bo bidestxistina berjewendîyeka derqanûnî û hwd. wekî bertîl tên qebûlkirin. Ev sûc, bi gelek rê û rêbazên cuda derdikeve meydanê; dayîna pereyên neqdî, bexşandin, dîyarîyên ku qîmeta wan a sembolîk pir zêde ye, teklîfeka ku faydeyeka şexsî jê bê standin û gelek cureyên din ên bertîlê, wekî sûcê bertîlstandinê hatine qebûlkirin. Kiryarên wan kesên ku di şîrketên anonîm da dixebitin, eger wek bertîl bên binavkirin, ceza û mi'eyîdeyên curcebur yên bertîlxwarinê û bertîldayînê, di zagonan da bi awayekî berfireh hatine te'rîfkirin.

### 3.2. Bexşandin û Sponsorî

Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, piştgirîyê nade kar û kiryarên derqanûnî, projeyên ku kîn û nefretê berbelav dikin an jî çalakîyên ku bengîtîyên zîyandar di nav civakê da derdixin holê.

Daxwazîyên bexşandina neqdî an jî cureyên din ji bo Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, herwiha pêşnîyazên sazîyan yên li ser berpirsyarîya civakî, pêşî ji bo Lijneya Venêran û Kontrolê tên şandin. Ev lijne, daxwazî û pêşnîyazên li ser bexşandinê, li gor guncavbûna rêzik û stratejîyên komeleyê dinirxîne û derbarê şopandina bexş û çalakîyan da, fikr û ramanên xwe dinivîse û ji bo pejirandinê dişîne ber destê Serokê Lijneya Rêvebiran.

Her cure daxwazîyên piştevanîya dezgehî û sponsorîyê, ji bo Lijneya Venêran û Kontrolê tên şandin. Daxwazîyên ku ji alîyê vê lijneyê ve wekî "erênî" û "bêlayen" hatine pesendkirin, ji bo Serokê Lijneya Rêvebiran tên pêşkêşkirin.

Li Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, her cure daxwazîyên bexşandin, piştevanîya dezgehî û sponsorîyê, tên qeydkirin.

### 3.3. Rastîya Qeydîyan

Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, li gor rêzikname û qanûnan, ji qeydkirin û parastina her cure hesab, fatore û belgenameyên kar û çalakîyan, berpirsyar e. Li ser wan belgenameyên hesabdarîyê yên ku qeydiyên her cure kar û barên ticarî tê da hene, bi tu awayî guhertin nayên kirin. Rastîya van qeydiyan, bi rêya kontrolên navxweyî, nirxandinên xetereyan, çalakîyên venêran û peyîtandinê, raporkirin û çavdêrîkirinê, teqez tê pesendkirin.

## 4. T'ELÎMATÊN KOMELEYÊ

Divê fînansmana projeyê, li ser bernameya xebatên komeleyê bandoreka neyînî nehêle û hevsengîya kar û barên komeleyê xirab neke. Çavkanîya fonekê, kesayetîya xwebeşxeka komeleyê an jî sazîyeka fermî eger ji bo komeleyê xetereyekê derxe holê, dahata ji vê çavkanîyê ji alîyê komeleyê ve nayê qebûlkirin.
Ji bo ku sebixweyî û rûmeta komeleyê di bin bandoreka neyînî da nemîne, heta neyê pesenkirin ku sazîyek di warê bertîldayîn an jî bertîlstandinê da sûcdar nehatîye dîtin, ji wan sazîyên ku navê wan tevlî lêpirsînên bertîlê bûne, dê tu cure fon neyên qebûlkirin.
Parastina serbixweyî û rûmeta komeleyê, di serî da berpirsyarîya xebatkar û rêvebiran e.

1. Heke xebatkarekê/a komeleyê, li ser bexş an jî alîkarîyeka ji bo komeleyê hatî kirin an jî dê bê kirin, xwedî şik û guman be ku dê ev bexş an jî alîkarî, bi awayekî cuda serbixweyî û rûmeta komeleyê têxe xetereyê, divê vê rewşê yekser ji bo Lijneya Venêran û Kontrolê ragehîne. Berpirsyarîya vê lijneyê jî ew e ku, rewşê yekser ji bo Lijneya Rêvebiran ragehîne û xetereyê rave bike.
2. Hewce bike, xebatkarên komeleyê an jî Lijneya Rêvebiran, li ser qebûlkirin an jî redkirina fonekê, dikarin ji Lijneya Şêwirmendan bipirsin û ji wan rêberî û şêwirmendîyê bixwazin.
3. Ji bo hemû serîlêdanên bangewazîyên projeyan, biryara dawî ya Lijneya Rêvebiran, teqez divê bê wergirtin.

## 5. BICIHANÎNA BIRYARAN Û LÊPIRSÎNA ENCAMAN

Ev belgename, 30ê Hezîranê, sala 2022yan ji alîyê Lijneya Rêvebiran ve hatîye weşandin û li gor şertûmercên serdemê û pêwistîyên qanûnî, salê carekê tê nûjenkirin.